

Agahdariyên derbarê COVID-19 (28.08.2020)



1. AGAHDARÎ JI BO KESÊN VEDIGERIN NAVA WELAT

KESÊN KU JI HERÊMÊN METIRSÎDAR TÊN, MECBÛRIN XWE TÊST BIKIN. HETA KU ENCAMA NÊGATÎV YA TÊSTÊ DERNEKE, EW KESÊN JI HERÊMÊN METIRSÎDAR HATINE, DIVÊ 14 ROJAN DI KARANTÊNA DE BIMÎNIN.

Heger tu ji herêmeke metirsîdar derbasî nava Mannheimê bibî, **divê** tu yekser şehirdariya Mannheimê li ser vê yekê agahdar bikî! Ji kerema xwe yekser piştî vegera xwe Emalekê ji vê navnîşanê re bişîne:

31corona@mannheim.de

[Divê tu di wê E-Mailê de navên **hemî** kesên malbata xwe/ku di mala te de dijîn, binivîsî: navên wan, dema jidayikbûna wan, dema hatina wan û heger bizanibî jimareya geşta ezmanî (Flugnummer), tu ji kîjan Welatî/Welatan vegeyayî û ka tu 14 rojên berî ku tu vegeyî li ku derê bûyî.

Pêwîstiya şehirdariya Mannheimê bi navnîşana E-Mail û navnîşana mala te heye (ka tu dê li dema karantêna xwe li ku derê bî) û heger mumkin be jimareke telefûnê jî binivîse, taku mirov karibe zû têkiliyê bi te re deyne.]

2. Lî ku derê û çawa têt çê dibe?

Qanûn dibêje, ku divê ew kesên ku ji herêmên metirsîdar hatine, li dema ku bigihîjin nava Almaniya, divê ew yekser têsta Korona ji xwe re çêkin. Mirov dikare ji şûna vê têtê, encama nêgatîv ya têsta Koronayê bide dayra dewletê, lê divê ew encama têtê ne ji 48 saetan kevintir be.

Divê ew têt li welatekî endam di Yekîtiya Europa de hatibe çêkirin yan di taqîgeheke din de ku navê wê li ser malpera enstîtûta Robert-Koch hatibe nivîsandin: ww.rki.de/covid-19-tests. Divê ew raporta têtê yan bi zimanê almanî yan bi zimanê inglîzî hatibe nivîsandin.

Hun dikarin hemî naveroka qanûna derbarê pêdiviya çêkirina têtê ji bo kesên ji herêmên metirsîdar hatine, li ser vê malperê bixwînin:

**HALÊ HAZIR JI MISAFIRÊN JI HERÊMÊN METIRSÎDAR HATINE,
TÊSTÊN BÊ PARE TÊNE ÇÊKIRIN:**

- Navendên têtê ji bo têtên bê pare li hemî firokxaneyan hene.
- Navendên têtê li hindêk rawestgehên tirênan hene (wek mînak Stuttgart)
- Navendên têtê li cihên veysandinê yê curbecur li ser rêyên xurt yê terembêlan, piştî derbaskirina qapiyên sînorî, hene.
- Standina civanan li ba textoran di rêya kombenda sendîkeya textoran re:
Tel: 116117 (bêy kod)
- Ji bo misafiran (ne hemwelatîyên alman yan kesên, ku mala wan li Almaniya ye), ku têne nava Almaniya, garantî TUNE YE, ku têsta bê pare ji wan re werin çêkirin. (Divê mirov hêdî mesrefa wê têtê ji ba xwe bide)
- Navenda têtê li nexweşxaneyê Mannheimê bi tenê têtê ji wan kesan re çê dîke, yê ku nîşanên nexweşiyê li ba wan hebin.

Lê heger te têtêk çêkiribe yan na, divê tu bi her hal dema ku tu dîsa ji herêmeke metirsîdar vegeyîyî, tu têtêk bi desthilatên herêmî re deynî 31corona@mannheim.de û wan li ser hatina xwe agahdar bikî!

Hun dikarin agahdariyên herî nû bi zimanên curbecur li ser malpera şehirdariya Mannheimê bixwînin

<https://www.mannheim.de/de/informationen-zu-corona/informationen-in-verschiedenen-sprachen>

Hay ji xwe û kesên din hebe, û tendurist bimîne!